

EGER MIROV HEVMÎNANÎYÊN ZIMANÎ¹ YÊN K'URDÎ-R'ÛSÎ DI KONTÊK'STA DÎROKÎ DA BINIRXÎNE...

R'êziman qanûnan nade zimên,
lê qanûnan ji zimên hiltîne.

Bêlînskî V.G. (1811 – 1848) –
r'exnrgerê wêjeyî yê r'ûs.

Ezîz ê Cewo Mamoyan

Zimanzanîya giştî dide zanîn, ku zimanên hindewropî xwedî t'aybetmendîyên hevp'ar in, ên ku guvahîya hevbeşîya bingeha pêkhatina wan didin. Û ew t'aybetmendî jî ev in: *mînahevîya bêjeyî (lêk'sîkî), hevbeşîya t'aybetmendîyên awazî û p'ergala r'êzimanî û bineşewazên (modêl) sazîkirina hevokan ên mînanî hev...*

Erê, ew hemû wisa ye, lêbelê, hevmînanîyên (*analogy*) zimanî bi bingehîn p'ir'ê caran û bi giranî jî di zimanên heman k'oma zimanên malbeta hindewropî da r'astî mirov tên, em bibêjin, yên ji k'omên *slavî, îranî, gêrmanî, r'omanî, kêltî, hindarîyî* û yên dinê, yên ku bêhtir xwedî t'aybetmendîyên hevbeş in, ne ku zimanên ji k'omên cuda yên heman malbetê...

Û lewra jî, dema di hinek zimanên ji k'omên cuda yên malbeta hindewropî da hevmînanîyên p'eyvên r'ehî an t'aybetmendîyên r'êzimanî p'ir' r'astî mirov tên, bi xwezayî hinek pîrs r'ûdidin, û divê mirov bersîva wan bide...

Di vê gotarê da emê di derbarê hevmînanîyên p'eyvên r'ehî û t'aybetmendîyên r'êzimanî yên k'urdî û r'ûsî da biaxivin. Û ev zimanan jî, wek ku tê zanîn, ji k'omên malbeta hindewropî yên cuda ne: yek ji k'oma zimanên *îranî* ye, yê dinê – ji k'oma zimanên *slavî*. Û emê hewl bidin, di vê çarç'oveyê da bi r'êya dahûrandina (analîz) zimanzanî bersîvan ji pîrsên r'ûdayî r'a bibînin û, her weha, wana di kontêk'sta dîrokî da binirxînin.

Zimanê r'ûsî, berovajî wan zimanan, ên ku pêdivîyên lêk'olînên di derbarê wan da heya dawîyê nehatine bersivandin, bi bingehîn di pîrsa lêger'inên zimanzanî da pîrsgirêkên wê yên ta'ybet nînin. Ew bi sedsalan zimanê fermi yê dewletê bûye, bi vî zimanî di dibistanan, xwendegehan, zanîngehan û sazî û dezgehên dinê da p'erwerde pêk hatye. Di înstîtûtên akadêmî û navendên cuda yên zanistî û p'ererdehî da di derbarê wî da lêk'olîn pêk hatine û îro jî pêk tên. Ew, wek ziman, ji her hêlan va p'ir' baş hatye makkirin.

Lê, dîsa jî, ji hêla r'êgezên r'êzimana zanistî û zimanzanîya hemdemî va, di makkirinên wî yên sistêmî yên demên cuda da jî nêr'inên cuda r'astî mirov tên ... Û ev jî xwezayî ye!

Lêbelê, r'ewşa lêk'olînên zimanê k'urdî û p'erwerdeya bi wî p'ir' cuda ye.

Piştî wê, ku K'urdistana bûye mîtingehê a navnet'ewî, ew di navbera çar dewletên herêmê da hatye p'arç'ekirin, gelê k'urd hatye dabeşkirin, zimanê wî, çand û nasnameya net'ewî ji hêla r'êjîmên mêtînger va hatine qedexekirin, r'ewşa lêk'olînên zimanê k'urdî û p'erwerdeya bi wî hê jî li ser asta here jêrîn dimînin.

Û, her çendî di vî warî da r'ewşek a weha ya neyînî li holê bûye jî, di serdemek a dîrokî da di welatên cuda da, bi bingehîn jî, li derveyî K'urdistana, di warê lêk'olînên zimanê k'urdî da hinek gavên erênî hatine avêtin. Lêbelê, ji ber r'ewşa heyî, ewan lêk'olîna nikaribûne hemû t'aybetmendîyên zimanê k'urdî r'avebikin. Û, di encamê da, li ser gelek pîrsên r'êzimana k'urdî heya îro jî gengeşî r'ûdidin.

Lê, her çî jî hebe, bingeha zanistî, ya ku di warê zimanzanîya giştî da hatye danîn û ezmûnên (cêr'ibandin) lêger'inî, yên ku hatine destanîn, ji bo lêk'olînên zimanê k'urdî bûne binaxeyek a zanistî, û îro êdî zimanzanî dikare bersîva gelek pîrsan bide û gotina xwe bibêje.

¹ *Hevmînanîyên zimanî (Linguistic analogies)* – dema p'eyv, an navgînên dinê yên zimanên cuda bi wat'eyî û şewazî mînanî an nêzîkî hev in, ji ber ku ew zimanana li ser bingehê pêk hatine.

Zanîyaran, bi bingehîn jî ên ewropî, ji bo ku *net'ewyet, ziman, çanda, kevneşopî û dîroka gelê k'urd û welatê wî* – *K'urdistanê* ji nêzîk va nas bikin, bi baldarîyek a mezin lêger'înên zanistî pêk anîne. Û ne k'urd, ne jî K'urdistan ji bo wan ne tiştne xiyalî û ne r'eal bûne.

Weha, yek ji pîonêrên (serk'êşê destpêkî) k'urdzanîya R'ûsîyayê *Vilyam Dîttêl*, ê ku di destpêka sedsala XIX da r'êwîtîyek a sê salan di R'ojhilata Navîn da pêk anîbûye, nivîsye, ku dema r'êwîtîya wî ya ji Dîarbek'irê heya sînorên Sûrîyayê di derbarê erdnîgarîyê û net'ewzanîyê (êt'nografi) da gelek ç'avdêrîyên wî pêk hatine. Ku r'êya wî li Mardînê, Dîarbek'irê, Nîzîbînê û Ûrfayê r'a derbaz bûye. Ku ew welat, ên ku ew li wan r'a derbaz bûye, *beşên Kurdistanê ne* (cudakirin a me ye. – E.C.) û kêmtên zanîn.²

Lêbelê, divê bê zanîn, ku baldarîya hember zimanê k'urdî di cîhanê da hê berê, di nîveka sedsala XVIII da destpêbibûye. Û êdî di dawîya heman sedsalê da mîsîonêrê (*şandar*) îtalî *Gart'sonî* piştî r'êwîtîya xwe ya li R'ojhilata Navîn R'êziman k'urdî diweşîne (R'oma – s. 1787), a ku di cîhanê da ya yekem tê hejmartine.³

R'ojhilatanê r'ûs ê navdar *Pyotr Lêrx* dinivîse, ku R'êzimana *Gart'sonî* di nava zanîyarên r'ojavayî da berbi zimanê k'urdî baldarî hişyar kirye, ku piştî weşana wê, ne ku t'enê r'êzek hîpot'êzên zanistî hatine weşandin, lê her weha, jimarek a mezin lêger'înên zimanzanî hatine pêkanîn.

Piştî weşana R'êzimana *Gart'sonî* di cîhanê da baldarîya berbi zimanê k'urdî zêdetir dibe, di derbarê derfet'ên lêk'olînên di wî warî da tê govtogokirin. Paşê, hê dereng, zanîyarên alman *Ê. R'udîgêr* û *A. Pott* di berhemên xwe da êdî li ser bingeha destanên wî warî, di derbarê cîhê k'urdî di k'oma îranî ya malbeta zimanên hindewropî da dinivîsin.⁴

Paşê hinek lêger'îner destnîşan dikin, ku gelek p'eyv û t'aybetmendîyên r'êzimanî di k'urdî û zimanên dinê yên îranî da an mînanî hev in, an jî ji heman bingehê pêk hatine (*Ê. R'udîgêr, A. Pott, G. A. Hurnlê, F. Myüllêr*). Paşê, hê dereng, hinek lêger'îner heya mînakên hevminanîyan di k'urdî û zimanên dinê yên hindewropî da tînin (*Pol Bêydar* û hinekên dinê). Lêbelê, lêger'înên ku paşê di welatên cuda da pêk hatine, bi bingehîn vegotinî-danasînî bûne, û, anegorî kvneşopîya pêkhatî, di prîzmaya farsî r'a (bi ç'avê wî zimanî) li zimanê k'urdî nihêr'îne, lewra ku yên ku di vî warî da gavên yekem avîtine, yan bi r'êzimana farsî r'a nas bûne, an jî di derbarê wê da lêger'în pêk anîne.

Piştî r'a nêr'în dertên holê, ku, eger encamên lêk'olînên zimanê k'urdî di warê filolojîya îranî da bîna k'aranîn, dê kêrî armancên lêger'înên befirehtir bîna, ku lêk'olînên di wî warî da dê ji bo r'avekirina hinek dîyardeyên Avêstayê û zimanên dinê yên îranî bîna.

Zimanzanê vîenayî *F. Myûlêr* dide bawerkirin, ku “*r'onîkirina cîhêr'engîyên zimanên îranî dê t'êra xwe ne r'êkûpêk û t'am be, eger t'aybetmendîyên awazsazî, p'eyvgu-hêr'î û p'eyvsazîya zimanê k'urdî li ber ç'av neyên girtin*”.⁵

Bi vî awahî, zimanê k'urdî, yê ku bingehên destpêkî yên cuda yên mak-zimanê hindewropî p'arastine, dibe armanca baldarîya zimanzanên pisporîya berfirehtir.

Û, her çiqas, lêger'înên vî warî bi bingehîn vegotinî-danasînî bûne jî, lê ezmûnên (cêr'ibandin) lêger'înên dîrokî-hemberhevîkirinî yên di warê zimanên hindewropî da pêkhatî derfet'an didin, ku mirov dînamîka dîrokî ya pêşk'etinên zimanê k'urdî bişopîne.

Hê dereng, êdî di sedsala XX da hewl tîna dayîn, ku lêger'înên dîrokî-hemberhevîkirinî di warê zimanê k'urdî da pêk bînin. Di vî warî da lêger'înên zimanzanên sovêti *V.C. R'astorgûevayê* û *R. L. T'sabolov* cuda dibin.

Û di vê serdema dîrokî da matêrîalên bi nîrx ên zimanên cuda yên hindewropî berev-bûne, cêribandinek a mezin a lêger'înî hatye destanîn, bergên akadêmî û berhemên cuda yên lêger'înî hatine weşandin. Û li ser bingeha van hemûyan îro êdî mirov dikare di warê bingehên

² *Курдоев К. К. Грамматика курдского языка., М., 1978. С. 5.*

³ *Garzoni M. P. Grammatica e vocabolario della lingue kurda. Roma, 1787.*

⁴ *Rödiger E., Pott A. F. Kurdische studien // Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes. Dermold, 1840. Bd III. Hft. I; 1842. Bd IV; 1844. Bd V; 1850. Bd VII.*

⁵ *Курдоев К. К. Грамматика курдского языка., М., 1978. С. 7.*

hemhindewropî da lêger'inên zanistî yê k'ürtirîn pêk bîne.

Eger p'ir'anîya r'ojhilatzanên r'ojavayî di prîzmaya zimanê farsî r'a li k'urdî nihêr'îne, lê zanîyarê fransî *Pol Bêydar* bal k'işandye ser hevminanîyên zimanî yê k'urdî-fransî. Bi dîtina wî, zimanê k'urdî bi sazîya xwe ya bêjeyî û t'aybetmendîyên r'êzimanî va hinek hev-beşîyên xwe bi fransî r'a hene.⁶

R'onahîdarê ermenî yê sedsala XIX *Xaçatûr Abovyan* di berhema xwe ya “Yên kurd” da pêşnîyarî cihana zanistê dike, ku dest bi “lêger'inên wî gelê orîgînal û zimanê wî bikin, ku lêk'olînên wê binaxeya berhemdar dê kêrî dîrokzanî û zimanzanîya nîştîmanî bîn”.⁷

Di derbarê têk'iliyên dîrokî di navbera k'urdî û zimanên dinê yê hindewropî da pîsporên zimanzanîyê û k'urdzanên nêr'inên balk'êş anîne zimên. Lêbelê, ewana lêk'olînên xwe yê di warê zimanê k'urdî da anegorî wê t'êorîyê pêk anîne, ya ku li ser bingeha lêger'inên matêriyalên zimanên îranî yê dinê sazûye (bi bingehe jî, li ser ên farsî), û bi wî awahî t'aybetmendîyên rêzimanî yê k'urdî anegorî qanûnên zimanê dinê yê îranî hatine şirovekirin, lewra jî, r'esenîya zimanê k'urdî û dewlemendîya şewazên bêjeyî û t'aybetmendîyên r'êzimanî derî baldariya pêwîst mane. Û ev bûye sedem, ku gelek bingehe r'êzimanî yê mak-zimanê hindewropî, yê ku dikaribûn bi r'êya lêger'inên matêriyalên k'urdî bihatana şirovekirin, heya îro jî benda lêger'inerên xwe ne.

Lêbelê, îro êdî mirov dikare bi bawer bibêje, ku li ser bingeha cêr'ibandina berevbûyî (ezmûn) û matêriyalên zanistî yê di derbarê zimanzanîya îranî da, lêger'inên zimanê k'urdî gihîştine astek a berbiç'av. K'ar, ê ku di vî warî da heya îro hatibû kirin, bingehek ava kirye, a ku derfet'ê dide, ku mirov lêger'inên zimanê k'urdî bidomîne. Û zimanê k'urdî jî, yê ku ewqasî bi şewazên cihêr'eng ên bêjeyî û t'aybetmendîyên r'êzimanî va dewlemend e, û bi sazîya xwe ya bêjeyî ya ciyawaz va cuda dibe, bi hemû ciyawazî û dewlemendîyên xwe va ji bo lêger'inên zanistî yê bingehe hemhindewropî û hem-îranî ç'avkanîyek a hêja ye.

Di pêvajoya lêger'inên zimanê k'urdî da dem bi dem pîrs r'ûdidin, û mirov dişwar bikaribe yekser bersîvan ji bo wan bibîne. Mînak: “*Mirov çawa dikare şirove bike, em bibêjin, ku di K'urdistanê da berek (eşîr) a alan û herêma Dîgor' hene, û di heman demê da, du berekên gelê osêtîn (os) navên xwe alan û Dîgor' in? An jî, di Hindistanê da yek ji zimanên hindîya nû navê xwe têrahî ye, lê di K'urdistanê da berekek (eşîr) bi navê tîrahî heye? Di eyaleta Pakîstanê ya Sîndh û di herêmên Hindistanê yê Maharaştra, Gûcarat û R'acasthan da gelê sîndh (sînd) dijî, û zimanê wî jî sîndî ye (zimanekî k'oma r'ojavayî ya hindî), lê di K'urdistanê da bereka sindî heye?*”

Di encama lêger'inên me yê zimanzanî da derdik'eve holê, ku p'eyv-p'arînkên **lê, la, lê**, yê ku di zimanê k'urdî da hatine p'arastin, şewazên arxaîk (kevnemayî) ên zêderên **yê, ya, yê/yêd** in,⁸ ên ku bi şewazên xwe va mînanî an nêzikî zêderên makdêrî yê r'êzek zimanên dinê yê hindewropî ne: ên fransî – *le, la, les*⁹, ên îtalî – *il, la, le*¹⁰, ên îspanî

⁶ Di heman cîhî da, r'. 11.

⁷ Di heman cîhî da, r'. 5.

⁸ Di vê derbarê da bi hûrbîni di vê berhemê da heye.: *Мамоян А. Д.*, Грамматические категории существительного и основы индоевропейского праязыка в курдском. Изд-во С.-Петербургского ун-та, 2007. С. 77 – 105. Книгу можно читать здесь – https://www.academia.edu/38273718/ГРАММАТИЧЕСКИЕ_КАТЕГОРИИ_СУЩЕСТВИТЕЛЬНОГО_И_ОСНОВЫ_ИНДОЕВРОПЕЙСКОГО_ПРАЯЗЫКА_В_КУРДСКОМ_pdf

⁹ *Անտրյան Խ.*, Հիսլախար քերականություն հայոց լեզվի, հ. III, Եր., 1957 թ. էջ 946; *Катагошина Н. А. и др.*, История Французского языка, М., 1976 г. С. 26 –70; *Доза А.* История французского языка. М., 1956г. С. 295 и 300 – 301; *Ганишина К. А.* Французско-русский словарь. М., 1962г. С. 463 и 471.

¹⁰ *Անտրյան Խ.*, Հիսլախար քերականություն հայոց լեզվի, հ. III, Եր., 1957 թ. էջ 946; *Васильева-Шведе О. К. и др.* Теоретическая грамматика испанского языка. М., 1972 г. С. 63 – 67; *Канонич С. И.* Артикль в испанском языке, М., 1967 г. С. 5 – 33; *Кельина Ф. В.* Испанско-русский словарь, М., 1966 г. С. 350, 520 и 541.

– *el, la, los / las*¹¹, ên zimanê tîrahî, yek ji zimanên hindîya nû – *le, la*¹².

Û, weha, ji ber ku şewazên *lê, la, lê* di zimanê k'urdî da berî şewazên *yê, ya, yên/yêd* hebûne, lê evên dawîyê jî, wek ku çavkanîyên cuda guvahîyê didin, di zimanên kevnar ên hindîranî (arîyî) da du hezar salan berî Zayînê hebûne, wê demê dertê holê, ku şewazên wan p'eyvan ên bi *l*-ê dengxizîn ê nerm di mak-zimanê hindewropî da du hezar salan berî Zayînê hebûne, lewra ku, nêzikî hezarsala duyem ev awazê *l* di r'êzek zimanên hindewropî da êdî werguhêr'î *y*-ê nîvdeng bibûye. Wek mînak, wê demê ev p'eyv-p'arînanî di zimanên kevnar ên arîyî da ev şewazên xwe hebûne: di Avêstayê da – *ya, yā*, di sanskrîtê da – *ya, yā*, di medî da (yê bi sînî wek farsîya kevnar navkirine) – *hya/ya*...¹³

Lê ya here balk'êş ew e, ku di zimanên k'urdî û r'ûsî da, ji bilî gelek p'eyvên r'ehî yên hevbeş, yên wek: *jîn – жена (jêna)*, *bira – брат (brat)*, *dot – дочь (doç)*, *nig – нога (noga)*, *vir' – вратъ (vr'at)*, *birû – брови (brovî)*, *dir' – дрянный (dr'annîy)*, *ku – кулич (kûlîç)*, *sol – соль (sol)*, *mîşk – мышь (mîş)*, *beran – баран (baran)*, *kit – кот (kot)*, *r'iz – риз (r'îs)* û gelekên dinê,¹⁴ wisa jî hevmînanîyên t'aybetmendîyên r'êzimanî hene. Ku di r'êzimanên herdu zimanan da jî hatye p'ejirandin, xwedêgiravî, r'engdêr zayend û jimara xwe hene û tên tewangdin (?!). Û ev jî ne t'enê ne anegorî xwezaya wan zimanan ne, lê, her weha, ne anegorî sazîya wan (û ne t'enê ya wan!) a r'êzimanî ye jî.

Bi dîtina zanîyaran, hebûna hevmînanîyên t'aybetmendîyên r'êzimanî û yên p'eyvên r'ehî di zimanên k'urdî û r'ûsî da ji bo lêger'inên zimanzanî nîrxekî giranbuha ye.

Lêbelê, li vîra, bi xwezayî, dikare pirsek a heşmendî r'û bide: “*Ewqas p'eyvên r'ehî yên hevbeş di van zimanan da ji k'u hatine? Ma ne, ew du zimanên ji k'omên cuda yên malbeta zimanên hindewropî ne, û di wê derbarê da, ku, dikare, wana ewqas p'eyv ji hev wergirtibin, li ber heşê mirov r'a jî derbaz nabe, lewraa ku, welatên wan gelan bi hezarê kîlômêtiran ji hev dûr in, û bi t'u awahî agahîyên di derbarê t'êk'ilî an danûstandinên di navber wan da di dîrokê da nehatine bîranîn?*” – Û heya, eger di sedsala XVIII da nûnerên art'êşa Împêratorîya R'ûsîyayê, an jî hinek diplomat-lêger'îner û mîssîonêr (*şander*) çend caran çûbin nava k'urdan jî, ew seredanana nikaribûne ji bo ji hev wergirtina ewqas p'eyvên r'ehî bibin bingeh. Ji bo ku r'ewşek a wisa pêk bihata, divê di navbera herdu gelan da p'êwendî û danûstandinên cihêr'eng û aktîv di serdemeke dîrokî ya dirêj da pêk hatibûna.

Lêbelê, hîç agahîyek a dîrokî ne di derbarê cînarîya erdnîgarî ya van gelan da, ne jî di derbarê t'êk'ilîyên demdirêj û aktîv ên bazirganî-darayî, siyasî, çandî û yên dinê di davbera wan da, nîne. Her t'enê dawîya sedsala XVIII û destpêka ya XIX hinek aktîvî di nava danûstandinên herdu gelan da tê xuyan. Û danûstandinên weha jî ji bo ku ewqas hevmînanî di zimanên van gelan da p'eydabibin, nikaribûne bibin bingeh.

Û ev jî wê demê, dema ku hinek gel hene, yên ku bi hezarsalan di herêmekê da dijî, cînarên hev ên nêzik in, heya di hinek cîhan da nûnerên wan di nava hev da dijîn, di dîrokê da afrandinên wan ên gelêrî û zargotina hevbeş hebûne, lê hevmînanîyên t'aybetmendîyên r'êzimanî an jî p'eyvên r'ehî di zimanên wan gelan da nehatibûne dîtin. Û heya, eger hinek p'eyvên hevbeş hebûne jî, ewana ji zimanekî derazî yekî dinê bûne, ango, jihevwergrartinên zimanî bûne. Lê di zimanên r'ûsî û k'urdî da gelek hevmînanîyên p'eyvên r'ehî û t'aybet-

¹¹ *Աճառյան Խ.*, Լիակատար քերականություն հայոց լեզվի, հ. III, Եր., 1957 թ. էջ 946; *Васильева-Шведе О. К. и др.* Теоретическая грамматика испанского языка. М., 1972 г. С. 63 – 67; *Канонич С. И.* Артикль в испанском языке, М., 1967 г. С. 5 – 33; *Кельина Ф. В.* Испанско-русский словарь, М., 1966 г. С. 350, 520 и 541.

¹² *Աճառյան Խ.*, Լիակատար քերականություն հայոց լեզվի, հ. III, Եր., 1957 թ. էջ 938.

¹³ Подробно см.: ссылку 7, с. 87 – 89.

¹⁴ *Мамоян А. Д.*, Грамматические категории существительного и основы индоевропейского праязыка в курдском. Изд-во С.-Петербургского ун-та, 2007. С.97 – 100, также: *Макаренко В. В.* Откуда пошла Русь. М., 2005. С. 114–117, 260– 280; Того же: *Ключи к дешифровке истории древней Европы и Азии.* М., 2006. С. 20, 148, 155, 193–197; того же: *У русского и курдского народов более трех тысяч родственных слов* // газета «Свободный Курдистан». 2006. №6 (39).

mendîyên r'êzimanî hene, her çiqas, herdu gel bi hezaran kîlomêtiran ji hev dûr dijîn.

Û hûrbînîyek a dinê jî: r'onaydarê mezin ê ermenî *Xaçatûr Abovyan*, dema di derbarê govendên k'urdan da dinivîse, destnîşan dike, ku ew mînanî *xorovod* a r'ûsan in (r'ûs.: *хоровод* // *xorovod*).¹⁵

Balk'êş e, ne?! K'urd ji bo ermenîyan gelekî nenas nînin, ewana bi hezarsalan cînarên hev ên nêzik bûne, lê nivîsk'arê ermenî govenda k'urdî û xorovoda gelekî dinê, ya gelê r'ûs hemberî hev dike, yê ku bi hezaran kîlomêtran dûrî gelê k'urd diji!...

Bûyereka weha, bi serê xwe, guvahîyek a dîrokî ya balk'êş e (bila, hemma, ne ya zimanzanî be jî!), û nabe, ku dema mirov pîrsa hevqewmîya herdu zimanan (her weha, ya gelan jî!) dinirxîne, evê r'astîyê bê baldarî bihêlir.

Û, ji bilî vê, wek ku li jorê hate gotin, zimanê k'urdî û K'urdistanê r'êzek net'ew-nav (êtnonîm) û warnav (toponîm) ên cuda p'arastine, û lêger'inên di vî warî da jî, dê derfetên nû ji bo naskirin û zanîna paşer'oja me ya hevbeş a hemhindewropî vekin.

Û li vîra, bi xwezayî, pîrs dertê holê: "*Di van zimanên ji k'omên cuda yên malbeta hindewropî da wqas hevmînanîyên p'eyvên r'ehî û t'aybetmendîyên r'êzimanî ji k'u p'eyda bûne?*"

Ew cêr'ibandîn (ezmûn), ên ku heya îro di encama lêger'inên zimanên hindewropî da berevbûne, û dîroka pêkhatin û belavbûna wan gelan di cîhanê da derfetê didin, ji bo zimanzanî bersîva van pîrsan û yên dinê bide.

Mirov îro êdî dikare bi bawer piştr'astbike, ku k'urdî û r'ûsî ne t'enê wek du zimanên hindewropî xwedî yek bingehe ne, lê wisa jî, hebûna gelek p'eyvên r'ehî û t'aybetîyên hevbeş ên herdu zimanan di wê derbarê da dibêjin, ku ewana di serdemek a dîrokî da di nava malbata zimanên hindewropî da li ser bingehek a ji bo herdu zimanan hevbeş pêşk'etine.

Lê, dîsa jî, li vîra r'êzek pîrs r'ûdidin: "*Ew bingehek a çawa bûye? Wê demê, êdî ew, ku k'urdî ji k'oma zimanên îranî ye, lê r'ûsî – ji ya slavî, li k'u ma? Di k'îjan waran da bingeha hevbeş ji bo herdu zimanan yek maye, lê li k'u cudahî li ber ç'avan in? Ew şewaz, ên ku paşê, hê derng p'eyda bûne, li ser çi bingehi pêşk'etine? Eger di zimanê k'urdî da ew-qas gelek hevmînanîyên şewazên bêjeyî û yên t'aybetmendîyên r'êzimanî hene, yên ki di zimanên hindewropî yên ne îranî da jî hene, ev nayê wê wat'eyê, gelo, ku zanîyar-zimanzan hê divê cîhê k'urdî di malbeta zimanên hindewropî da dîyarbikin?*"

Helbet, ev pîrsana yên govekek a dinê ya pîrsgirêkan in û pêdivîya xwe bi bersivên bi zanistî misoger hene. Û, bi xwezayî, ji bo r'onîkirina vê pîrsgirêkê her mercek heye, ew jî pêkanîna lêger'inên p'ir'alî yên zanistî ye.

Lêger'inên me p'eytanadin, ku hevmînanîyên şewazên îroyîn ên zêderên makdêrî yên zimanê k'urdî (*y'e, ya, *yî, y'en/y'ed*), bi hinek guhar'tininên awazî yên biç'ûk va, di r'ûsî da hene [*uy / yû (îy), ая (aya), ое (oyê), ye (îyê)*], ên ku di r'êzimana r'ûsî da wek afîk's (daçek) ên r'engdêran hatine p'ejirandin.¹⁶ R'êyên p'eyvguhêrîyê, yên ku ev şewazên zimanê r'ûsî û hevmînanîyên wan ên zimanê k'urdî têr'a derbaz bûne, mînanî hev in. Lewra jî

¹⁵ Արմիսի Խ., Երկերի լիակատար ժողովածու: Ութ հատորով, ութերորդ հատոր: Երևան – 1958 թ. էջ 364 և 385:

¹⁶ Морфология русского языка 1. Имена прилагательные: грамматические категории и разряды. – https://is.muni.cz/do/rect/el/estud/pedf/js18/morfologie_rustina/web/ru/ch06.html; Право-писание суффиксов и окончаний имен прилагательных – <https://videotutor-rusyaz.ru/ucheni-kam/teoriya/142-pravopisanieimenprilagatelnyh.html>; также соответствующие разделы этих трудов: Виноградов В. В. Русский язык. М., 2001 г., Грамматика русского языка / Под ред. В. В. Виноградова, Е. С. Истриной, С. Г. Бархударова. Т. I. М., 1952 г., Грамматика русского языка. Часть I. Фонетика и морфология. Учебник для 5 и 6 классов семилетней и средней школы. Под редакцией акад. Щербы Л.В. Учпедгиз – 1946 г., Современный русский язык. Морфология. Под редакцией акад. В. В. Виноградова. М. 1952 г., Лопатин В. В., Улуханов И. С., Словарь словообразовательных аффиксов современного русского языка. Москва – 2016 г.

me lêger'inên matêrialên zimanê r'ûsî bi heman pêşnûmayê (şêma) pêk anîn, a ku me bi wê lêger'inên matêrialên zimanê k'urdî jî pêkanîbûn: ji bo wê wek bingeh p'eyvebendên makdêrî (atrîbûtîv) hatne hildan.

Lêger'inên zimanzanîyê didin xuyan, ku di herdu zimanan da jî sazîyên (sîstêm) r'engdêran mînanî hev in, ku di r'êzimanên herdu zimanan da jî hatye p'ejirandin, xwedêgiravî, r'engdêr zayend û jimara xwe hene, û tîn tewangdin (?!). Ku hevminanîyên (*analogy*) şêwazên p'arînkana, ên ku di r'êzimana r'ûsî da wek daçekên (afik's) r'engdêran tîn hejmartin (ên r'engdêrsaz), di zimanê k'urdî da jî hene, lê, di r'astîya xwe da, ewana di herdu zimanan da jî zayend û jimara navdêran didin zanîn, ne ku ya r'engdêran (heman tişt wisa jî ji bo jimarên r'êzî (hejmar) ên zimanê r'ûsî derbaz dibe!). Û ew şêwazên r'engdêran yên bi wan "afik'sên" navborî va êdî navdêrên sazber in, ne ku – r'engdêr.

Ev p'arînkana di zimanê r'ûsî da r'êyeke wisa ne sade derbaz bûne, ku îro mirov dijar bikaribe dîyar bike, k'a ew ji k'îjan beşê axavtinê ne, lêbelê, dema mirov wan û zêderên makdêrî ên zimanê k'urdî hemberî hev dike, bingehên pêkhatina wan li ber wî vedibin...

Û piştî nirxandina mînakên zimanên k'urdî û r'ûsî dertê holê, ku:

– her çiqas ev p'arînkana di nava axavtinê da di dawîyê da bi r'engdêran r'a tîn deranîn û di nivîsarê da bi wan r'a tîn nivîsîn jî, lê di r'astîya xwe da ew p'abendî navdêran in û zayend û jimara wan didin zanîn; c

– lê, dema r'engdêr di axavtinê da bi wan p'arînkên dawîyê va tîn k'aranîn, ew derbazî nava r'êzên navdêran dibin, lewra jî, wek navdêr, zayend û jimara xwe hene û tîn tewangdin;

– dema di zimanê r'ûsî da r'engdêr, di hevokê da dibe beşê navî yê pêvebirê (*predicate*), ew bêyî wan "afik'sên" navborî [-ая (-aya), -ый (-îy), -ое (-oyê), -ые (-îyê)] tîn k'aranîn: Он был чист и невинен. Наз и бос, пойдешь в царстве небес. Он очень красив. Флаг так красен, что!..., û yên dinê. Û bêyî wan "afik'san" jî t'aybetîyên navdêr (dazanîna çawanîya tiştan, an ji tiştêkî dinê pêkhatina wana) di hevokê da hîç lewaz nabe. Di zimanê r'ûsî da wisa jî şêwazên r'engdêran ên r'esen (ên bêyî wan "afik'san") hatine p'arastin, ên wek: нов (*nov*), стар (*star*), молод (*molod*), дорог (*dorog*), хорош (*xorox*), свеж (*svêj*), слеп (*slêp*), велик (*vêlik*), глух (*glûx*), горяч (*goryaç*), мощ (*moşç*) û gelekên dinê, yên ku wek şêwazên kurt ên r'engdêran tîn navkirin, lê şêwazên wan ên "afik's" bi dawîyê va – yên t'am tîn hejmartin, û t'aybetmendîyên navdêran jî hema li ser wan dinivîsin.¹⁷

– ev p'arînkên zimanê r'ûsî di pêvajoya dîrokî da wek "afik'sên" p'eyvsaz hatine p'ejirandin, lêbelê, ew di r'astîya xwe da zêderên makdêrî bûne (*definite article*) û bi sazîya xwe ya awazî û bêjeyî va hevminanîyên (*analogy*) zêderên makdêrî yên zimanê k'urdî ne.

Ji bo ku di wê da bawerbin, em şêwazên zêderên herdu zimanan hemberî hev bikin:

Zêderên makdêrî
yên zimanê k'urdî

ya
yê
(*yî)
yên/yêd

Zêderên makdêrî
yên zimanê r'ûsî

-ая (-aya)
-ый / -ий (-îy)
-ое (-oyê)
-ые (-îyê)

Ev her t'enê t'aybetmendîyek a r'êzimanî ye! Lê, îjar, çiqas t'aybetmendîyên dinê yên r'êzimanî û p'eyvên r'ehî di zimanê k'urdî da hene, yên ku wisa jî hevminanîyên xwe di r'ûsî û zimanên hindewropî yên dinê da hene, û benda lêger'inêrê xwe ne!

Û lêger'inên znisatî yên pêşer'ojê yên di vî warî da dikaribûn dîroka paşer'oja me ya hevbeş a hemhindewropî r'onî bikirana...

¹⁷ Di vê derbarê da bi hûrbîni li vir binîhêr'in: Современный русский язык. Морфология. Под редакцией акад. В. В. Виноградова. М. 1952 г. Стр. 135 – 137; про порядковых числительных – стр. 229 – 232.

Û wisa jî!

(Li şûna paşgotinê)

... Lêger'înerê alman ê nîveka pêşin a sedsala XVIII *Îohann Haynrîx Drîmêl* di destpêka p'irtûka xwe ya “Serpêhatîya danasînên dîrokî di wê derbarê da, ku r'ûsîyayî jî araratîyan pêk hatine, yên ku pey Sêlava Cîhanî r'a gelê yekem bûne” da dinivîse, ku dema ewî serpêhatîyên P'irtûka Pîroz, ên ku nayên govtûgokirin, xwendine, bê guman, li bal wî nêr'înek pêk hatye, ku piştî Sêlava Cîhanî k'eştîya Nuh P'êxember li welatê Araratê r'awestyaye, lewra ku *Mûsa* vedibêje: “Û k'eştî li ser ç'îyayên Araratê r'awstyayî”. – Ev jî tê wê wat'eyê, ku nişteciyên van deveran araratî bûne. – Ew şiroveya xwe weha encamdar dike.

Û piştî vê, ji bo ku piştr'ast bike, k'a di pêvajoya dîrokî da navê welatê Araratê çawa hatye guhar'tin, *Drîmêl* dinivîse, ku bi giştî wisa dibe, ku guhar'tina navê gelên binecî û welatê wan dibe tiştêkî pêkan, û, wek misogeriya vê dîtina xwe, ew mînaka guhar'tina navê xakên almanan tîne (di destpêkê da xaka almanan di destê kêltan da bû, paşê ew an wek Gêrmanîya, an Alêmanîya, an Fransîya hatye navkirin) û dibêje, heman tişt di dema xwe da bi navê araratîyan û xaka Araratê r'a jî pêk hatye. ... Ku her t'enê di Nivîsa Pîroz da serpêhatîya di derbarê wan bûyeran da hatye p'arastin, ên ku piştî Sêlavê di Cîhana me da pêk hatine. Û, ku di wê derbarê da ne ku t'enê Mûsa p'êxember, lê wisa jî p'êxemberên dinê vedibêjin, ên wek: *Îsayîya, Yêrêmîya û afrandarê p'irtûkên p'adişahîyan* (mabesta wî k'eşîş *Yêzdra* ye, yê ku di nava îslamê da bi navê *Ûzayr* tê zanîn – E. C.).

Û, dema di derbarê vê pîrsê da nêr'înen cuda dinirxîne, *Drîmêl* dinivîse, ku hê berî bûyîna *Îsa* navê Araratê bi zimanê cihûdan ê T'emîya Kevn (The Old Testament) wek קדש (Kardo. – E. C.) hatye nivîsîn, ku werger'a vê p'eyvê bi zimanê xaldêyî (keldanî) heye, û ew hêjayî her r'êzgirtinekê ye, lewra ku ew wat'eya vê p'eyvê zelal û r'ast dide zanîn, ku gelên r'ojhilatî wê wek *kard, kord, kûrd* lêvdikin, lê yewnanî –wek *kord, gord*, û ji van jî ev navên hanê pêk hatine: *Kardû, Kordanîya, Kûrdam, Kûrdîstan, Kordakên, Kardûxên, Kordîlîa, Kordîêa*. Ku ev hemû p'eyvana jî heman xakê û heman gelî didin zanîn, ê ku hîç dagerkereki nikaribûye wî ji welatê wî yê kal û bavan derîne – ew jî K'urdistan û gelê k'urd in...

Piştî vê *Drîmêl* dinivîse, ku, wek ku agahîyên wî anîne, piştr'ast dikin, ku k'eştîya Nuh P'êxember li K'urdistanê r'awestyaye, ew wisa jî piştr'ast dikin, ku k'urd gelê yekem ê piştî Sêlava cîhanî bûne...¹⁸

Helbet, di dawîya sedsala XVIII da *Drîmêl* nikaribûye bûyerên dîrokî bi lêgêndên Încîlê şirove neke, lewra ku t'evahîya dîroknûsîya wê serdemê, bi çi awahî jî lê binihêr'î, girêdayî efsane û lêgêndên Încîlê bûne. Helbet, em ya lêgêndan ji lêgêndan r'a bihêlin, lê dîsa jî, divê neyê jibîrkirin, ku di bingeha her lêgêndekê da bûyereke dîrokî (mezin, an bi-ç'ûk), an jî bîranînek a di derbarê wê da veşartî ye. Lewra jî, wek ku nabe, ku mirov bide xuyan, ku ew wan t'evan bi r'êzê nabîne, wisa jî nabe, ku ew bûyeran t'evlihev bike, an jî wan lêpovajî bike û wat'eya wan biguhêr'eîne. Mirov divê di derbarê wan da lêger'înan pêk bîne, û li ser bingeha analîzên zanistî r'astîya wan r'ave û r'onî bike.

Di derbarê vê û gelek tiştên dinê da – di gotara xudanê vê gotarê ya: “Paradok'sa dîrokê – çawa agahîyên di derbarê Sêlava Cîhanî da berovajî kirine!”¹⁹

¹⁸ Подробно см. в книге: *Иоган Генрих Дримель, Опыт исторического доказательства о происхождении россиян от араратцев, как от первого народа послѣ всемірнаго потопа, превложенный съ нѣмецкаво. Санктпетербургъ – 1785 г. Стр.: 5 – 25.* (Книга на немецком языке была издана в 1744 г. в г. Нюрнберг). – <https://knigogid.ru/books/185541-8-opyt-istoricheskago-dokazatelstva-o-proishozhdenii-rossian-ot-araratcev-kak-ot-pervago-naroda-posle-vsemirnago-potopa>, или: <https://kp.rusneb.ru/item/reader/iogana-genriha-drimelya-opyt-istoricheskago-dokazatels-tva-o-proishozhdenii-rossian-ot-araratcov-kak-ot-pervago-naro-da-posle-vsemirnago-potopa>

¹⁹ [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/%20PARADOK S A DÎROKÊ](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/%20PARADOK%20S%20A%20DÎROKÊ)

WÊJE Û ÇAVKANÎYÊN DINÊ

1. *Васильева-Шведе О. К. и др.* Теоретическая грамматика испанского языка. М., 1972 г.
2. *Виноградов В. В.* Русский язык. М., 2001.
3. *Ганишина К. А.* Французско-русский словарь. М., 1962г.
4. Грамматика русского языка. Под ред. *В. В. Виноградова, Е. С. Истриной, С. Г. Бархударова.* Т. I. М., 1952.
5. Грамматика русского языка. Часть I. Фонетика и морфология. Учебник для 5 и 6 классов семилетней и средней школы. Под редакцией акад. *Щербы Л.В.* Учпедгиз – 1946 г.
6. *Доза А.* История французского языка. М., 1956г.
7. *Звягинцев В. А.* Очерки по общему языкознанию. М., 1962.
8. *Йоган Генрих Дримель,* Опыт исторического доказательства о происхождении россианъ отъ араратцовъ, как от перваго народа послѣ всемірнаго потопа, предложенный съ нѣмецкаво. Санктпетербургъ – 1785 г.
9. *Канонич С. И.* Атикль в испанском языке, М., 1967 г.
10. *Катагошина Н. А. и др.,* История Французского языка, М., 1976 г.
11. *Кельина Ф. В.* Испанско- русский словарь, М., 1966 г.
12. *Курдоев К. К.* Грамматика курдского языка., М., 1978.
13. *Лопатин В. В., Улуканов И. С.,* Словарь словообразовательных аффиксов современного русского языка. Москва – 2016 г.
14. *Макаренко В. В.* Откуда пошла Русь. М., 2005.
15. *Макаренко В. В.* Ключи к дешифровке истории древней Европы и Азии. М., 2006.
16. *Макаренко В. В.* У русского и курдского народов более трех тысяч родственных слов // Свободный Курдистан. 2006. №6 (39).
17. *Мамоян А. Д.* Грамматические категории существительного и основы индоевропейского праязыка в курдском: Изд-во С.-Петербургского ун-та, 2007.
18. *Маслов Ю. С.* Введение в языкознание. М., 1975.
19. *Розенталь Д. Э.* Итальянский язык, М., 1949 г.
20. Современный русский язык. Морфология. *Под редакцией акад. В. В. Виноградова.* М. 1952 г.
21. *Garzoni M. P.* Grammatica e vocabolario della lingue kurda. Roma, 1787.
22. *Rödiger E., Pott A. F.* Kurdische studien // Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes. Darmstadt, 1840. Bd III. Hft. I; 1842. Bd IV; 1844. Bd V; 1850. Bd VII.
23. *Մրմիշի Իւ.,* Երկերի լիակատար ժողովածու: Ուր ի հատորով, ուր երրորդ հատոր: Երևան – 1958 թ. էջ 364 և 385. // *Х. Абовян,* Полное собрание сочинений. Том восемь, Ереван, 1958 г.
24. *Մանգիշի Իւ.,* Լիակատար քերականություն հայոց լեզվի. Հ. III, Եր., 1957 թ.// *Ачарян Гр.,* Полная грамматика армянского языка. Т. III, Ер., 1957 г.
25. *Азиз э Джаво Мамоян,* Парадокс истории. Как искажали представление о Всемирном Потопе! (Статья) – https://www.academia.edu/120880818/ПАРАДОКС_И_СТОРИИ_КАК_ИСКАЖАЛИ_ПРЕДСТАВЛЕНИЕ_О_ВСЕМИРНОМ_ПОТОПЕ_
26. Морфология русского языка 1. Имена прилагательные: грамматические

категории и разряды. – https://is.muni.cz/do/rect/el/estud/pedf/js18/morfologie_rustina/web/ru/ch06.html

27. Правописание суффиксов и окончаний имен прилагательных. – <https://videotutor-rusyaz.ru/uchenikam/teoriya/142-pravopisanieimenprilagatelnyh.html>

05. 06. 2025 г.

г. Пятигорск

Binenimûneya gotarê ya bi zimanê r'ûsî li vira ye: https://www.academia.edu/129791729/ЕСЛИ_РАССМОТРЕТЬ_КУРДСКО_РУССКИЕ_ЯЗЫКОВЫЕ_АНАЛОГИ_Й_В_ИСТОРИЧЕСКОМ_КОНТЕКСТЕ_